Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2020
Sayı/Hejmar/Issue: 2
*e-ISSN 2717-8315*
*Sayfa/Page: 37-48*

# "Heyranok" Ji Hêla Şikl û Cureyê ve*

Mehmet Yıldırımçakar

Kurte

"Heyranok" yek ji cureyên edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Di nav keresteyên edebiyata kurdî ya gelêrî de ji ber taybetiyên xwe ye cihêreng, hêjayî gelek vekolînan e. Xebata me li ser diyarkirina şikl û cureyê heyranokan hûr dibe û hewl dide ku van heyranokan li gorî taybetiyên xwe yî naverokî û ruxsarî analîz bike, bi vê rêyê şikl û cureyê heyranokê diyar bike. Şikl û cure du xusûsên ji hev cuda ne; şiklên nezmê ji cudahiyên ruxsarî û cureyên nezmê jî ji cudahiyên naverokî derketine holê. Me di serî de şiklên heyranokê li gorî ristina serwayê, qeware, yeke û kêşa nezmê, di pey re cureyê heyranokê li gorî mijar, newa û fonksiyonê destnîşan kirin. Paşê, me heyranok di çarçoveyeke zanistî de, li gorî rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê analîz kirin. Di encamê de hat dîtin ku heyranok hem ji hêla teşeyî ve û hem jî ji hêla ruxsarî ve xwediyê taybetiyên xwemalî ye.

**Bêjeyên sereke**: Folklor, Helbesta Kurdî ya Gelerî, Heyranok, Şikl û Cure, Teşe, Ruxsar.

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi:16.10.2020
Accepted / Kabul Tarihi: 30.11.2020
Xwendekarê Doktorayê, li Zanîngeha Bîngolê, Turkiye / PhD Student at The University of Bingol, Turkey, mehmetyildirimcakar@gmail.com.
Orcid: 0000-0003-3565-1156
DOI: 10.5281/zenodo.4309734

Atıf: Yıldırımçakar, M. (2020). "Heyranok" Ji Hêla Şikl û Cureyê Ve", Kurdiyat, 2, 39-48.
Citation: Yıldırımçakar, M. (2020). "Heyranok" in Terms of Forms and Types", Kurdiyat, 2, 37-48.

* Ev gotar ji teza masterê derçûye ku bi navê "Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de; Mînaka Herêma Wanê" pêşkêşî Zanîngeha Mûş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî bûye.

## Tür ve Şekil Yönünden “Heyranok”

**Özet**

“Heyranok” anonim kürt halk edebiyatı türlerinden biridir. Anonim kürt halk edebiyatı malzemeleri içerisinde sahip olduğu özgün özelliklerinden dolayı bir çok açıdan incelenmeyi hak ediyor. Çalışmamız “heyranok”un tür ve şeklini belirleme üzerine eğiliyor ve “heyranok”ları içeriksek ve şekilsel özelliklerine göre analiz etmeye, bêylece “heyranok”un şeklini ve türünü belirlemeye çabalıyor. Tür ve şekil birbirinden farklı iki husustur; nazmın şekli dışsal farklılıklardan, türü ise içeriksel farklılıklardan meydana gelmiştir. Biz başta kafiye örgüsü, hacim, nazım birimi ve nazım ölçüsüne gore “heyranok”un şeklini, ardından konu, ezgi ve fonksiyonuna gore “heyranok”un türünü saptadık. Sonra, “heyranok”u bilimsel bir çerçevede, kültür, folklore ve edebiyat bilimleri ışığında analiz ettik. Sonuç olarak “heyranok”un hem içeriksel hem de şekilsel özellikleri açısından orjinal özelliklere sahip olduğu görüldü.

**Anahtar Sözcükler**: Folklor, Anonim Kürt Halk Şiiri, Heyranok, Tür ve Şekil, Biçim, Form.



## “Heyranok” in Terms of Forms and Types

**Abstract**

“Heyranok” is one of the genres of the Kurdish folk literature. It deserves to be investigated largely as it includes many local features compared to other genres folkloric materials. This study of ours deals with different forms and types of *heyranok*s and attempts to analyse them according to their contents and shapes and thus to determine the type and form of each one of them. Form and type are two separate topics; while different forms of poetry covers a range of various shapes, different poetical types are related with contens and meaning. At the beginning we touched on the physical shape of *heyranok*s such as the rhyming process, length, type and meter of the poem and afterwards we mentioned its internal features concerning the topic, melody and function of the *heyranok*s. We then analysed *heyranok*s within an academic frame and in accordance with the methodological criteria of ethnography, folklore and literature. We consequently reached the judgment that *heyranok*s have unique features both in form and in contens as well.

**Keywords:** Folklore, Kurdish Folk Poetry, Heyranok, Form and Type, Unit, Shape

**Destp**êk

Nezm navê gotinên bi awayekî bipîvan in ku ew biaheng hatine gotin û nivîsîn. Loma jî nezm û helbest ne heman tişt in. Di navbera her duyan de cudahî hene. Her helbest di heman demê de nezm e lê her nezm ne helbeste e. Ji bo nezmek bibe helbest divê tê de hunerek, di gotinê de spehîtî û resenî hebe. Em bi kurtî dikarin bibêjin helbest; şêweya nezmê ya ji hêla bedewî û zerafetê ve gihîştî ye. Ji berhemên bi nezmê hatine nivîsîn re menzûm an jî menzûme tê gotin. Berhemên bi nezmê hatine nivîsîn ji hêla şikl û naverokê ve ji hev vediqetin. Di navbera wan de cudahî hene. Şiklên nezmê ji cudahiyên ruxsarî û cureyên nezmê jî ji cudahiyên naverokî derketine meydanê.

Lêkolerên edebiyat û zimannasiyê demeke dûr û dirêj e li ser şikl û cureyê dixebitin. Li gorî van vekolîn û xebatan hema bêje hemûyan li hev kirine ku şikl û cure du xusûsên cuda ne, şikl bêtir taybetiyên derveyî îfade dike, cure jî tevî taybetiyên şiklî, mijarê/babetê jî navxweyî dike û nemaze şêwaz jî di diyarkirina cureyî de gelek girîng e. Wekî Oğuz diyar kirî; dema em behsa nezmê bikin, di diyarkirina cureyê de bi tenê şikl û mijar têrê nakin, di binavkirina berhemên helbesta gelêrî de, newa xusûsa herî girîng e[1]. Ango di binavkirina berhemên wekî heyranok, payîzok, dîlok, şeşbendî û hwd. de tevî şikl û mijarê, newa jî unsureke bivênevê ye.

Di helbesta kurdî ya gelêrî de her şiklên nezmê bi taybetiyên xwe yên xasî xwe hene. Unsûrên derveyî yên helbestê şiklê nezmê pêk tînin. Ev unsûrên derveyî, taybetiyên helbestê ne ku helbestê dixine sazûmanekê. Bi kurtî; ristina serwayê, yekeya nezmê, kêş û qewareya helbestê şiklên nezmê diyar dikin. Bi taybetî jî ristina serwayê û qewareya helbestê ji bo diyarkirina şiklê nezmê gelek kêrhatî ne.

Di gerdîşa helbesta kurdî ya gelêrî de ji dabeşkirin û binavkirina helbestê ya li gorî mijar, newa û fonksiyonê re cureyê nezmê tê gotin. Di vê gerdîşê de dema cureyê nezmê tê diyarkirin li taybetiyên helbestê yên şiklî zêdetir li teybetiyên helbestê yên naverokî û pêşkêşkirinê tê nêrîn. Di helbestên nivîskî yên derveyî helbesta gelêrî dimînin de, mijar bi tena serê xwe têra diyarkirina cureyê nezmê dike. Lêbelê helbesta gelêrî di dorhêlên devkî de çêdibin, têne veguhêstin û bi gelemperî bi newayekê têne gotin û her cure di nava civakê de xwediyê fonksiyonekê ye. Loma jî naverok tenê ji bo diyarkirina cureyê nezmê bi tena serê xwe têrê nake û newa jî divê bê hesibandin. Carna naverok û newa jî têrê nakin, kêm dimînin. Vêga fonksiyon jî ji bo diyarkirina cureyê nezmê cihekî girîng digire. Ango naverok bi tena serê xwe di diyarkirina cureyê nezmê de ne pîvan e. Newa û fonksiyona helbestê jî ji bo destnîşankirina cureyê nezmê lazim in.

Ev gotar pala xwe dide tezeke masterê ku li ser heyronêkan hûr dibe û heyranokê ji gelek hêlan ve vedikole. Xebat digel ku piraniya mînakên xwe ji heyranokên di dawiya tezê de wekî pêvek cîwarbûyî digire jî her wiha ji bi hezaran heyranokên ku ji gelek kitêbên berhevkariyê hatine girtin jî sûdê werdigire. Ji ber ku heyranokên ber destê vekoler him ji hêla hejmara xwe ve gelek in him jî heyranokên gelek deverên Kurdistanê yên cuda cuda ne, tesbîtên hatine kirin ji bo heyranokê dibine tesbîtên giştî. Bi vî awayî piştî lêkolînê taybetmendiyên şikl û cureyê heyranokê derdikevin holê.

**1. Şiklê Nezmê**

Unsurên helbestê yên derveyî, şiklê nezmê pêk tînin. Ev her çar hêmanên sereke şiklên nezmê diyar dikin; ristina serwayê, yekeya nezmê, kêş û qewareya helbestê.

1 Oğuz, M. Öcal. *Halk Şiirinde Tür, Şekil ve Makam* (Ankara: Akçağ Yayınları, 2001), 13.

### 1.1. Ristina Serwayê

Ristina serwayê ji şiklê kombûna risteyên helbestê pêk tê. Ji bo diyarkirina şiklên nezmê girîng e. Di helbesta kurdî ya gelêrî de li gorî sazûmana serwayan şiklên nezmê xwediyê çend rêzikên taybetmend in. Dema em li gorî sazûmana serwayan li heyranokê binêrin, heyranok jî xwediyê çend rêzikên taybetmend e. Li gorî heyranokên ber destê me piraniya heyranokan ji çar risteyan pêk tên û ristina serwaya hayranokan bi piranî "aaxa" ye. Lê di nav heyranokan de yên ristina serwaya wan bi şêweya "aaaa", hem "aaax", hem jî "abab" çêdibin jî hene. Lê li gorî xwendin û nirxandina textên heyî ev cure kêm in. Ger em van rewşên awarte nehesibînin em dikarin bibêjin ristina serwaya heyranokan "aaxa" ye. Lê gorî vê agahiyê em nikarin li gorî sazûmana ristina serwayê bi awayekî teqez heyranokê ji cureyên din cuda bikin. Lê ev yek ji bo diyarkirina şiklê nezmê dibe nîşaneyeke girîng. Çar cure şemayên serwayê hene; Serwaya tekûz, ya çeprast, ya pêçoke û ya hevrêsîn. Lê em rastî şemayên pêçoke û hevrêsînê nehatin di heyranokên ber dest de.

#### 1.1.1. Serwaya Tekûz

Ger hemû risteyên bendê di navbera hev de serwadar bin, dibe serwaya tekûz. Ristina serwaya tekûz bi vî awayî tê nîşandan: (a, a, a).

Kerî pezê qijbel***ek***o
Girtye zevya zeger***ek***o
Pez hezar e şivan y***ek***o[2]

Ez helîyam bûme ş***ima***
Heval i hogirê dora min ker bûn, ne gotin ç***ima***
Derdê mêrê kotî, xasya t***ima***[3]



Caran risteyek serbest tê honandin; risteya yekem, duyem û çarem di navbera hev de serwadar dibin û risteya sêyem serbest tê honandin. Bi vî awayî tê nîşandan: (a, a, x, a)

Tu kurapê mîn î k***er***o
Malê heft qirala, danzde dûwala xu da s***er***o
Te ne ´z xastim ne ´z revandim
Te dame yekî xelkê xerîb, li heft bavê me jî d***er***o[4]

Çi palekî berî b***est***a
Tu yê zorê nede tilyê d***est***a
Xazya ez ê bibama tîreme'rkî
Min ê serê tilya destê te big***est***a[5]

2 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê* (Muş: Zanîngeha Muş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Teza Masterê, 2017), 107.
3 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 101.
4 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 91.
5 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 97.

### 1.1.2. Serwaya Çeprast

Ger risteya yekem û sêyem di navbera hev de û ya duyem û çarem jî di navbera hev de cuda cuda serwadar bin, dibe serwaya çeprast. Ristina serwaya çeprast bi vî awayî tê nîşandan: (a, b, a, b).

Kuro gede te ser min ra girtî ya***r*** e
Heke li min rintir e li te bimb***arek***
Heke li min kotîti***r*** e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê c***arek***[6]

### 1.2. Qeware (Hecm)

Qewareya helbestê, tê wateya hejmara bendên helbestê. Bi dirêjbûn û kurtbûna helbestê re têkilîdar e. Wekî mînak; ger em bibêjin ev helbest ji sê an çar bendan pêk tê wê gavê ev li ser qewareya helbestê dibe nirxandinek. Qeware jî ji bo diyarkirina şiklên nezmê girîng e. Cureyê helbesta gelêrî yên wekî sêxiştî û dûrik ji yek yekeyê pêk tên. Wê demê em bibêjin qewareya sêxiştî û dûrikan kurt e, destnîşankirneke di cî de ye. Her wiha destan ji gelek bendan pêk tên û dirêjtirîn şiklê nezmê ye. Li gorî vê agahiyê em dikarin bibêjin qewareya destanê di nav şiklên helbesta gelêrî de ya herî dirêj e.

Dema em li heyranokan binêrin em dibînin ku ji yek yekeyê pêk tên. Li gorî heyranokê ber dest heyranoka herî kurt sêriste ye û ya herî dirêj jî nehriste ye. Lê belê em di pirtûka Amîdî de rastî heyranokeke sî û yek risteyî hatin. Lê ev yek îstisna ye. Hema bêje piraniya heyranokan çarriste ne. Ango qewareya heyranokan kêm e, ev taybetmendiya heyranokê, wê ji şiklên nezmê yên wekî destan, lawij, dîlokê vediqetîne. Vêga em dikarin bibêjin qeware ji bo diyarkirina şiklên heyranokê diyardeyeke girîng e. 

Ev heyranoka jêr ji sê risteyan pêk hatiye. Ji hêla qewareya xwe ve heyranokeke kurt e.

Ez ê teyr im teyrtawis im
Li zozana li çîmena dilemisim
Ez ê ser ra qurs im, bin ra diteyîsim[7]

Ev heyranoka jêrê ji bîst û yek risteyan pêk hatiye. Ji hêla qewareya xwe ve dirêj e.

Herê sîysinê
Rihsipîkêt me çûne zozana
Zozanêt'Ebabekir
Kaniyêt Serhedêt jorî
Li min û bejna bilind bîne şîr û şekir
Sala par û pêrar
Sing û ber û memikêt te'ebdala Xwedê
Koz û pawanêt ber destê min bûn
Kilîla dila li destê min bûn

6 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 99.
7 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 96.

Evroke keft û min berzekir
Herê guhînê
Dengê te be min deng e
Dengê te be min derman e
Ez dê çime
Ser tenîrkêt sindîyan û evan gulyane
Dê pişta xwe keme xêrî
Berê xwe deme xerîbîyan e
Hingî terka bejûbala
Navtenga zirav çavêt reş û belek bikem
Li ser singê min bibîte
Xirrêna tevrûbêra ne[8]

### 1.3. Yekeya Nezmê

Yekeya nezmê taybetmendiyeke şiklî ya helbesta gelêrî ye. Bi kombûna misreyan ango bi hejmara risteyên helbestê re eleqedar e. Riste bi bandora kirinên nêrîtî/adetî bi rewşa yekeyên pendî û birêkûpêk têne cem hev û helbestê pêk tînin. Bi gotineke din helbest, tevahiyeke ku ji yekeyên nezmê pêk hatiye. Yekeya nezmê, perçeya helbestê ya herî piçûk, bihevre û biwate ye. Bi gotineke din helbest, tewekî/tûneke ji yekeyên nezmê pêkhatî ye.

Di helbesta kurdî ya gelêrî de yekeya nezmê piranî sêriste û çarriste ne lê ev ne pîvaneke teqez e. Helbestên ji pênc risteyan û heta sî û yek risteyan pêk tên jî hene. Di hinek şiklên nezmê yên wekî heyranok û payîzokan de yeke ne birêkûpêk e. Di hinek şiklên nezmê yên wekî destan, dîlok û lawij de yeke birêkûpêk in. Yekeyên destanan bi piranî çarriste ne lê yên sêriste û pêncriste jî hene.



Her çiqas di heyranokan de yekeya nezmê nebirêkûpêk be, ji sedî sed çarriste nebin jî, gelekên wan çarriste ne. Her wisa heyranokên ji sê, pênc û heta sî û yek risteyan pêk tên jî hene û hejmara risteyên heyranokan herî kêm sê ye. Lê li gorî heyranokên ber destê me, rêjeya heyranokên çarriste gelek bilind e. Li gorî van agahiyan em dikarin bibêjin yekeya heyranokê çarriste ye. Yekeya nezmê jî ji bo diyarkirina şiklê heyranokê dibe nîşaneyeke girîng.

#### 1.3.1. Sêriste

Ez ê reş im biha nakim
Ez ê herim ce qelaçî xu qelakim
Ez ê qelenê çîla, çe’vreşa, bedewa ´l ser xu rakim[9]

#### 1.3.2. Çarriste

Çemê Kurrê lemelem e
Kevrê ortê çar kelem e
Kurê kerê durî ´m here
Ez ne sêva devê te me[10]

8 Amîdî, Rêkêş. *Heyranokêt Kurdî*. (Hewlêr: Weşanxaneya Spîrez, 2010), 768.

9 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 91.

10 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 94.

**1.3.3. Pêncriste**

Kuro gede te ser min ra girtî yar e
Heke ´j min rintir e li te bimbarek
Heke ´j min kotîtir e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê carek[11]

**1.3.4. Şeşriste**

Ez ê çîyê dinêrim bêhna bê tê
Be're dinêrim keştî ´l rê tê
Min go qey esker e ´l eskeryê tê
Min go qey şofêr e ´l şofêryê tê
Min nizanbû gedelawkê min e
Çante dêst e ´l qolordyê tê[12]

**1.3.5. Heftriste**

Ev şeve were nik me bi mêvanî
Dê ciyê te çêkem li danga malê, li nîva xanî
Dê bo te vekujim, mihê digel beranî
Wextê dayîk û babêt min gote min
Tu ya dîn bûyî, tu nizanî
Dê bêjim bo çi xelk û'alem zewicîn
Mabeyna min û lawkê min bûye kafirstanî[13]

**1.3.6. Heştriste**

Berrî berrî sed car berrî
Ez nizanim ji germê ye yan ji sermê ye
Na wele ji mîrata xurbetyê ye
Gedelawkê ´m rengê xu guherîye
Gedelawkê ´m dike bê ye
Be'ra Wanê nade rê ye
Ez ê singê Avzema xu bikme keştî
Bira bide serda bê ye[14]



11 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 99.
12 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 95.
13 Sadînî, M. Xalid. *Heyranokên Kurmancî*. (İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2011), 110.
14 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 104.

### 1.3.7. Nehriste

Bêmaldînê dara hewşa me da dartûyîn e
Xelkê min ra digo wey bêbavê malê lawkê te tunîne
Min go gelî gundîyû cînarê mixenetno
Hûn ê gazin i lomekan li min nekin
Emnîyeta malê dinyayê tune ye li dinyayê dimîne
Di dêrisê gundê me da
Wextê çavê minê bi bejn i bala gedelawkê min dikeve
Minjêwetrê xîmê binê beryanî şewitî
Terş i talanê mala paşê hemû´j min ra tîne[15]

### 1.3.8. Sîwyekriste

Û niha em ê li jêr heyranokeke sî û yek riste bidin. Ev heyranoka jêrîn, heyranoka herî dirêj e ku me heta niha bidest xistiye ye.

Sebra dila min ji te ra go
Ez ê navê te nizanim
Ji te ra dibêm pêşmalzerê
Biroj dibêm pêşmalzerî
Bişevê dibêm pêşmalzerê
Gustîl zêrrê qaş elmasê
Navê min li serê
Heb xazila binya mala duh vêçaxî ji vê derê
Tenê navê min û xwe nivîsî
Ser bendê wê mêzerê
Mêzer şûştî havêtî ser darê vê çeperê
Ez ê bêjim besse bêbabê
Pişta xwe bide xênî
Kêleka xwe bide çaxê vê pencerê
Bira kotî miskînî mêrê te
Xwe bide li ser xanî
Ez ê werim hewilkê vê sivderê
Destê xwe bidem nava reşgulîya
Tilîpêçkê xwe têxim ber qaşa vê kemberê
Ramîsanekê ji xalûxetê gerdenê
Xebxebkê bin guhara
Jê keremkim
Bira kotî miskînî mêrê te
Ji dêrda were

15 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 96.

Bi çavê serê xwe bibînî
Bira bibêje eşqa dila
Bi gotina Xaliqê'alemê
Rebê di jorîn e
Bira bibêj qîza kerê
Vêca were destê vî camêrî bigre
Ji mala min derê herre[16]

**1.4. Kêş (Pîvan)**

Heyranokên bikêş û yên bêkêş hene. Lê piraniya heyranokan bêkêş in ango kêşa piraniya heyranokan serbest e. Di piraniya heyranokan de hejmara kiteyên risteyan di navbera xwe de ne yeksan in. Loma jî li gorî kêşê diyarkirina şiklê heyranokê ne pêkan e. Û di heyranokan de kêşa arûzê qet nehatiye bikaranîn.

Heyranokên jêr xwediyê kêşa kiteyî ne. Her çar risteyên her du heyranok jî ji heşt kiteyan pêktên. Lê ev awarteyek e. Li gorî mînakên heyranokên li ber destê me rêjeya heyranokên bikêş gelek kêm e.

Kuro gede Kurhesinî (8)
Tu hem gul î hem sosin î (8)
Dinya alem bibêje jî (8)
Tu serdilka dilê min î[17]. (8)

Çemê Kurrê lemelem e (8)
Kevrê ortê çar kelem e (8)
Kurê kerê dûrî ´m here (8)
Ez ne sêva devê te me[18] (8)

Di van her du heyranokên jêr de kêşa kiteyî tune ye, lê hejmara kiteyên risteyan ne wekî hev bin jî nêzî hev in.

Wey eskero wey eskero (8)
Dê ´b axîno bav ´b kesero (9)
Heke hûn gedelawkê min naznakin (10)
Ew eskerê kincê wî zero[19] (9)

Kuro gede min qîzxatî te kurxatî (12)
Were em ê bibin cote teyrê serberatî (14)
Em ê heram bikin naniavê vî welatî[20] (14)

16 Amîdî, Rêkêş. *Heyranokêt Kurdî*, 861.
17 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 90.
18 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 94.
19 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 96.
20 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 93.

Di heyranokên jêrîn de ristina serwayê bi şiklê (a, a, x, a ) ye û risteya sêyem risteya serbest e û çawa ristina serwayê xirab dike her wisa carînan gelek dirêj dibe û kêşa kiteyî jî xirab dike. Ji hêlek din ve em binirxînin, di van cure heyranokan de heyranokbêj hesta xwe ya herî xurt û bingehîn di risteya sêyem de gotiye û loma jî ev riste ji yên din dirêjtir bûye.

Gedelawkê min şivanê hûr kavira (12)
Kavir kirin danzde birra (8)
Hûn Xudê kin hûnê gedelawkê min nekin tu nifira (17)
Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra[21] (12)

Hîv derketye hîva zer e (8)
Minê pêşa mêzera xu da ber e (11)
Heçyê orta her du dila, her çar çe'va pîs xeberde (16)
Ew ne ´l ometa pêxember e[22] (9)

Û dîsa di hinek mînakan de risteya dawîn ji yên din dirêj tir e. Di van cure heyranokan de heyranokbêj hesta xwe ye herî xurt di risteya dawîn de aniye ziman. Loma ev riste ji yên din dirêjtir bûye.

Hîv derketye hîva sava (8)
Hîv xeyîdye naçe av a (8)
Xazî îman i Qur'anê (8)
Gedelawkê mi ´l ser singiberê ´m biba zava[23] (14)

Çemo çemo mestî mestî (8)
Tu ´dçî naçî qe nawestî (9)
Te yê goştê min xar mane hestî (10)
Hestyê min wisa nin bîna darê rizî, pira ´şkestî[24] (16)



**2. Cureyê Nezmê**

Di destnîşankirina cureyê nezmê de sê pîvan hene; mijar, newa û fonksîyon. Li jêr em ê heyranokan li gorî van her sê pîvanan libo libo binirxînin.

**2.1. Mijar (Babet)**

Di heyranokê de mijar evîn û evîndarî ye. Ango heyranok li ser eşq û hezkirinê hatine honandin. Eşq û mijarên bi eşqê re têkilîdar naveroka heyranokan pêk tînin. Keç û xortên kurdan hestên xwe yên evîniyê, gilî û gazindên xwe, bi rêya heyranokan ristine û ji hevdu re gotine. Di heyra-

21 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 93.
22 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 92.
23 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 93.
24 Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de,* 92.

nokan de mijara evînê, mijara bingehîn e û mijarên wekî bêrîkirin, xerîbî, êş û kulên ji ber eşq û firqetê, gilî û gazind û hwd. jî bi awayekî bi evînê re têkilîdar derdikevin pêş. Vêga em dikarin heyranokan li gorî mijara wan ji cureyên din veqetînin û wekî cureyeke serbixwe diyar bikin.

### 2.2. Newa (Awaz/Melodî)

Muzîka her cureyê xasî xwe ye. Loma jî di diyarkirina cureyan de newa piştî mijarê xwediyê roleke mezin e[25] (Oğuz, 2001, 13).

Heyranok kurtehelbestên lîrik in û bi newayekê têne gotin. Wekî her cureyî heyranok jî xwediyê newayeke cuda ne. Hem di navbera cureyên helbesta gelêrî de hem jî di nava xwe de newayên heyranokê yên cihêreng hene. Dîsa em dikarin bibêjin ku her kes li gorî xwe heyranokan dirise û li gorî terza xwe melodiyekê ango newayekê lê dike û wisa distirê. Eşq û evîna her kesî xasî wî kesî ye û li gorî vê jî newaya her heyranokê, xasî ristarê wê heyranokê ye. Em nikarin bibêjin heyranok jî dikarin li gorî newaya xwe bêne senifandin. Lê em dikarin bibêjin heyranok li gorî newaya xwe ji cureyên din ên helbesta gelêrî cuda dibin.

### 2.3. Fonksiyon (Peywir/Erk)

Folklornasan, li ser fonksiyona berhemên devkî sekinîne. Her cureyê vegotinê xwediyê peywirekê ye di civaka ku tê de berbelav e de. Ev cure li gorî pêdiviyekê, ji bo çareserkirina pirsgirêka ji wê pêdiviyê zaye, ji bo kêmasiyekê tekûz bike xwediyê rolekê/fonksiyonekê ne[26] (Köse, 2002, 503).

Gelo heyranok ji bo çi, bi kîjan armancê, ji bo kîjan pêdiviyan têne gotin? Bersiva vê pirsê ji bo me girîng e. Em dê li gorî bikaranîna heyranokê bizanibin ka ev çi cure helbest e.



Dema dilê keçikekî dikeve xortekî an dilê xortekî dikeve keçikekî ew hestên xwe wekî heyranokekê dihonin û gilî û gazindên xwe bi rêya vê heyranokê ji hezkiriyê xwe re dibêjin; gilî û gazindên xwe li heyranokê bar dikin. Dîsa dema keç an jî xort ji hezkiriyê xwe dûr ketine, di navbera wan de astengî çêbûne, an jî hezkiriyê wan zewicîne, hestên xwe yên dilsoj ji hêla heyranokê anîne ziman. Vê yekê fonksiyona nameyeke eşqê daye heyranokê. Heyranok bûye tercumanê hestên wan kesan.

Ji ber ku fonksiyona hemû heyranokan yek e; pêywira nameyeke evînê hildaye, em nikarin heyranokan li gorî fonksiyona wan bisenifînin. Lê li gorî foknsîyona xwe ji cureyên din ên helbesta gelêrî vediqetin.

### Encam

Li ser şikl û cureyên berhemên helbesta gelêrî heta niha kêm xebat hatine kirin. Ji bo destnîşankirina şikl û cureyên helbesta kurdî ya gelêrî xebatên bi vî rengî gelekî girîng in. Li gorî vekolîna me heyranok hem ji hêla teşeyî ve hem jî ji hêla ruxsarî ve xwediyê taybetiyên xasî xwe ye. Li gorî gelekan heyranok cureyeke stranan e û hinek kes jî dibêjin heyranok dûrik in. Lê piştî xebata me, me destnîşan kir ku heyranok ne stran e ne jî dûrik e, heyranok berhemeke bi tena serê xwe ye. Hem li gorî ristina serwayê, yekeya nezmê, qeware û kêşa xwe taybetiyên wê yên xweser hene û hem jî li gorî naveroka xwe li cureyên din vediqete. Piraniya heyranokan ji çar

25 Öcal. *Halk Şiirinde Tür, Şekil ve Makam,* 13.

26 Köse, Nerin. “Tür ve Fonksiyon”. *Uluslararası Türk Dünyası Halk Edebiyatı Kurultayı (26-28 Mayıs 2000).* ed.. İsmet Çetin – Ayşe Yücel, (Ankara: Kültür Bakanlığı Yayıncılık, 2002), 503.

risteyan pêk tên û şêweya ristina serwaya hayranokan bi piranî "aaxa" ye. Lê di nav heyranokan de yên ristina serwaya wan bi şêweya "aaaa", hem "aaax", hem jî "abab" çê dibin jî hene. Lê li gorî vekolîna me, me destnîşan kir ku ev cure heyranok pir kêm in. Ger em van rewşên awarte nehesibînin em dikarin bibêjin şêweya ristina serwaya heyranokan "aaxa" ye.

Dema em ji hêla dirêjbûn û kurtbûnê ve li heyranokan binêrin em dibînin ku bi yek yekeyê pêk tên. Li gorî heyranokê ber dest, heyranoka herî kurt sêriste ye û ya herî dirêj jî sî û yek riste ye. Lê ev yek awarte ye. Me tespît kir ku piraniya heyranokan çarriste ne û qewareya heyranokan kêm e. Hat dîtin ku di heyranokan de yeke ne sabît e. Lê her çiqas yekeya nezmê nebirêkûpêk be jî, ji sedî sed çarriste nebin jî, praniya wan çarriste ne. Her wisa heyranokên ji sê, pênc û heta sî û yek risteyan pêk tên jî hene û hejmara risteyên heyranokan herî kêm sê ye. Lê li gorî heyranokên ber dest rêjeya heyranokên çarriste gelek bilind e. Li gorî van agahiyan derdikeve holê ku yekeya heyranokê çarriste ye.

Me destnîşankir ku heyranokên bikêş û yên bêkêş hene. Lê piraniya heyranokan bêkêş in ango kêşa piraniya heyranokan serbest e. Di piraniya heyranokan de hejmara kiteyên risteyan di navbera xwe de ne yeksan in. Dîsa hat dîtin ku hemû heyranok bi newayekê têne gotin. Hem di navbera cureyên helbesta gelêrî de hem jî di navbera xwe de newayên heyranokê yên cihareng hene. Em dikarin bibêjin ku her kes li gorî xwe heyranokan dirise û li gorî terza xwe melodiyekê ango newayekî lê dike û wisa distirê. Eşq û evîna her kesî xasî xwe ye û li gorî vê jî hasil bû ku newaya her heyranokê jî, xasî ristarê wê heyranokê ye. Her wiha dema dilê keçekî ketiye xortekî an dilê xortekî ketiye keçekî, hestên xwe wekî heyranokekê honandine û gilî gazindên xwe bi rêya vê heyranokê ji hezkiriyê xwe re gotine. Hat dîtin ku evîndaran fonksiyona/peywira nameyeke eşqê dane heyranokan.



**Jêder**

Amîdî, Rêkêş. *Heyranokêt Kurdî*. Hewlêr: Weşanxaneya Spîrez, 2010.

Köse, Nerin. "Tür ve Fonksiyon". *Uluslararası Türk Dünyası Halk Edebiyatı Kurultayı (26-28 Mayıs 2000).* ed.. İsmet Çetin – Ayşe Yücel. 503-508. Ankara: Kültür Bakanlığı Yayıncılık, 2002.

Oğuz, M. Öcal. *Halk Şiirinde Tür, Şekil ve Makam.* Ankara: Akçağ Yayınları, 2001.

Sadînî, M. Xalid. *Heyranokên Kurmancî*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2011.

Yıldırımçakar, Mehmet. *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê.* Muş: Zanîngeha Muş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Teza Masterê, 2017.